## Navenda Hevahengiyê ya Pêşîgirtin li Zêdegaviyê çi ye?

Civaka Almanyayê civakeke pirrçandî ye. Navenda Entegrasiyona navçeyî ya navçeya Viersen'ê ji bo îcadkirina atmosfereke civakî ku tê da danûstandina miyançandî (di navbera çandan da) karekî xwezayî û asayî ye, hewil dide. Ji bo vê yekê pêwîstî pê heye ku mirov bikarin bêyî pêş-dadwerî û bi rêzgirtin nêzikî hevûdu bibin.

Navenda Hevahengiyê ya Pêşîgirtin li Zêdegaviyê (KoEx) hin beernameyan amade dike û piştevaniya enistîtûyan ji bo dabînkirina derfetên vî karî dike:

- Gelo tu nîgeran î ku hin kes li dibistana te tundrêtî û zêdegaviyê bikin, lê nizanî ku dikarî serdana kê bikî? KoEx kesan li aliyên bersivdêr ên eseh vedigerîne.
- Gelo li lijneya te zêdetir dirûşmeyên klîşe û gotinên qewirîner tên gotin û ev yek divê bêyî tu nêrîneke nemîne? KoEx bijardeyên tevgeriyanê raber dike.
- Gelo tu dixwazî ku bernameyeke fêrbûna pisportiyê rûdana pisporî an projeyeke li dijî zêdegaviyê organîze bikî û li dû hin axêveran î an jî gelo hewcetiya te bi piştevaniyeke din heye? KoEx dikare ji bo vê mebestê şebekeyeke baş pêşketî bi kar bîne.

KoEx her wiha dikare têkildarî mijarên din ên giredayî bi mijarê piştgiriyê raber bike.

## Têkilî


**Tristan Osterfeld**
Telefon 02162 39-1719
Faks 02162 39-1726
tristan.osterfeld@kreis-viersen.de

**Michael Sönnert**
Telefon 02162 39-1776
Faks 02162 39-1726
michael.soennert@kreis-viersen.de



Piştgirîbûyî ji aliyê:

Ministerium für Kinder, Jugend, Familie, Gleichstellung, Flucht und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen

Ministerium für Schule und Bildung des Landes Nordrhein-Westfalen


KREIS VIERSEN



**Sozialamt**
- Kommunales Integrationszentrum -
Rathausmarkt 3 | 41747 Viersen
www.kreis-viersen.de



Herausgeber: Kreis Viersen - Der Landrat
Stand: November 2022
Fotos: © beeboys - stock.adobe.com


KREIS VIERSEN

Kommunales Integrationszentrum Kreis Viersen



# NAVENDA HEVAHENGIYÊ YA PÊŞÎGIRTIN LI ZÊDEGAVIYÊ

## li navçeya Viersen'ê

## Navenda Hevahengiyê ya Pêşîgirtin li Zêdegaviyê (KoEx)

Navenda Entegrasiyona li Civaka Navçeyî ji bo hevkariya miyançandî di warên cûr bi cûr ên jiyanê da dixebite.

KoEx wek beşeke Navenda Entegrasiyona li Civaka Navçeyî bi saziyên cûr bi cûr ra dixebite. Ev sazî an di warê pêşîlêgirtinê da çalak in û zanista têkildarî cûreyên zêdegaviyê vediguhezînin an jî di warê piştevaniya ji danûstandineke demokratîk û miyançandî da dixebitin.

Ji bilî vêya, ji berpirsyariyên KoEx'ê hevahengkirina navçeyî ya şebekeya dibistanan a bi navê "Dibistan bêyî nijadperestiyê – Dibistana xwedan wêrekî" ye. Gelek dibistan di kewşena vê navçeyê da ji wan cûreyên dibistanan pêştir tev li vê şebekeya dibistanan bûne.

Pêkvejiyana miyançandî li navçeya Viersen'ê tekûz e. Tevî vêya di dehsaliya derbasbûyî da zêdegaviyeke ber bi pêşketinê di civaka Almanyayê da dikarî were têderxistin.

Erka KoEx'ê ev e ku bilez û bi awayekî pêşîgirane li dijî van guhertinan raweste.

Bo vê mebestê KoEx girîngiyê dide hejmareke nêrînan û bala xwe dide ser rewşa niha ya lêkolînan. KoEx wek beşeke Navenda Entegrasiyona li Civaka Navçeyî xwedanê vê derfetê ye ku şebekeyeke ezmûnkirî ya pêkhatî ji aliyên hevkar bi kar bîne.

Zêdegavî tenê di cûreyên xwe da, çi ev cûre pêkhatî ji vînên siyasî an mezhebî bin, xuya nabe. Zêdegavî heta di navîna civakê da, dema ku kesên ji kok û etnîk, çand an dînekî din va heqaret li wan tê kirin, tê dîtin.

Mirov digel hevûdu ciyawaz in, zêdegavî û tundrêtî vê yekê înkar dike. Zzêdegavî neberanberiya mirovan destnîşan dike. Zêdegavî biyaniyan di vê meseleyê da sûcdar dike ku di civakekê da hin nakokî derdikevin.

KoEx vê meseleyê bi fermî nas dike ku li her civakekê hin nakokî û kêşe diqewimin. Ev taybetmendiya civakên miyançandî (pirrçandî) nîne.

Pirs ev e ku çawa divê li dijî vê meseleyê rawestin. Li gorî pisportiyên miyançandî, rûbirûbûna digel nakokiyan bi jîrî, amadetiya ji bo gotûbêjê û aştiyê pêkan e.

Pisportiyên miyançandî bingehek ji bo îmkana vekolandina nakokiyên xuyabûyî bi awayekî kêrhatî û avaker e. Ji ber vê yekê, veguhestina pisportiyên miyançandî şêwaza herî baş ji bo pêşîgirtin li zêdegaviyê ye. KoEx di veguhestina van pisportiyan da pişta te digire.